



Helwestek polîtîk a li dijî pergala Rêbertiyê ye

• Gulistan ÇIYA ÎKE

Em sala 20'an a komploya navnetewî ya li dijî Rêber Ebdullah Ocalan bi pêlek mezin a berxwedanê pêşwazî dikin. Vê berxwedana dîrokî di pêşengiya hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven de dest pê kir. Qêrîna Leylayê di nava demek kurt de li her devera Kurdistanê deng veda. Ji Welat heya derveyî welat de pêl bi pêl berxwedan mezin bû. Armanca berxwedana dîrokî a vê demê elbet şikandina tecrîda mutleq a li ser Rêber Apo ye.

Weke koma Înisyatîfa ji Ocalan re Azadî jî bi armanca şikandina tecrîda di ser Rêber Abdullah Ocalan, me di 17'ê Kanûna 2018'an dest bi greva birçibûnê ya bê dem û bê dorveger kir.

Îmralî pergalek tecrîd û îşkenceyê ye

Helbet çalakîyên bi armanca şikandina tecrîdê ji berê de di rojevê de ne. Lê belê pêvajoya çalakiyan a di pêşengiya Leyla Guven de dest pê kirî demek nû îfade dika. Em jî bi çalakiya xwe ji Strasbourg tevî vê qonaxa berxwedanê bûn.

Em baş dizanin pergala Îmraliyê ji binî de weke pergalek tecrîd, îşkence û izolasyonê hatiye plankirin. Ti eleqeya vê pergale bi hiqûqê re tine ye û xwe dispêre polîtîkaya qirkirinê. Bi temamî der hiqûqîyê û xwe dispêre polîtîkaya tinekirinê ya ku di kesayetiya Rêber Ocalan de li ser civaka Kurd tê ferzkirin. Lewma em dikarin bêjin Rêbertî jî 15'ê Sibata 1999'an ve di vê pergale de tê ragirtin. Raste ku şêwe û asta tecrîdê dem bi dem guherî, lê bi awayek sistematîk tecrîd her tim kûr û berfireh bû.

Em dizanin armanca tecrîdê ji destpêkê de ew e ku peywendîya Rêbertiyê bi gel û tevgerê re qut bibe. Ev yek xwe di kûrkirin û berfirehkirina şer de dide der. Di nava 20 salên Îmraliyê de her qonaxa şer bi tecrîda girankirî ya li ser Rêber Ebdullah Ocalan xwe da der. Lewma em dibêjin tecrîd peyama şer û qirkirinê ye. Di warê hiqûqî de tu pişt-palek vê pergala tecrîdê tine ye. Tenê bi şeklekê dikare were pênasekirin, ew jî helwesta polîtîk a li dijî berî pergala Rêbertiyê ye.

Azadiya jinê ruh û vîna vê tevgerê ye. Jin bi tevgera azadiyê re li Kurdistanê û herêmê bû xwedî hebûn, nasname, hêz û pergala. Xwebûna jinê bi feraseta azadiyê ya Rêbertiyê ve yekser girêdayî ye. Paradîgmaya Rêbertiyê jî ji xwe xwe dispêre azadiya jinê. Jin lewma jî hebûna xwe bi hebûna Rêbertiyê bi wate dikin. Peywendîya jinan û Rêbertiyê peywendiyek wateyê, hebûn û xwebûnê ye.



Berxwedana dîrokî a Rêbertî

Komploya navnetewî zêdeyî 20 sale di rojevê de ye. Helbet qonaxên vê komploye hene. Di qonaxa yekem de armanca komploye tinekirina Rêbertiyê bû. Bi vî awayî armanca komplojgeran ew bû şerek sedsalan bidin destpêkirin. Lê Rêbertiyê bi pêşdînek bêhempa qonaxa pêşî ya komploye pûç kir. Di pêvajoya Îmraliyê de jî komploye xwe bi awayên cuda da der. Geh bi tecrîda di nava tecrîdê de, geh jî bi pêkanînen tund yên li dijî Rêbertiyê, heya destwerdana fîzîkî kete rojevê. Lê belê li hundir berxwedana dîrokî ya Rêbertiyê, li derve jî bi berxwedana gel û tevgerê komplo hat pûçkirin.

Di roja me de, li herêmê şerê sêyem ê cihanê navend Kurdistan dimeşe. Di vî şerî de Kurd bi paradîgmaya Rêbertiyê bûn hêz, vîna û bi pergala bûn. Lewma îro hêzên navnetewî û herêmî dixwazin komploye bigehînin encamê. Mebesta van hêzan bi tecrîda roja me ew e ku Rêbertî jî vê dema dîrokî were tecrîdkirin. Dijber jî em dikarin bêjin, tecrîda esasî li ser civaka Kurdistanê tê ferzkirin. Tecrîdkirina Rêbertiyê lewma tecrîdkirina Civaka Kurdistan, gelên Kurdistanê ye.

Ev sê sale li ser vî esasî hevdiîna bi Rêbertiyê re bi awayeke nedîti tî astengkirin. Derbarê jiyana Rêbertiyê de tu agahî tune. Helbet ev yek îşaret bi xeteriyên mezin dika û nasibe qonaxên berê. Di nava 20 salên borî de, bi berxwedana Rêbertiyê, gel û tevgerê karîbû tecrîd were şikandin. Lê di vî dema dîrokî de çawa ku tecrîdê wateya şer û bê statû hiştina gelê Kurd, şikandina tecrîdê jî wateya tîkbirina vî konseptê.

CPT di bin bandor siyaseta Ewropayê de tevdigere

Me weke çalakger Strasbourg hilibijart, ji ber ku saziyên peywendîdar yên weke CPT û Konseya Ewropayê li vî derê ne. Her wiha CPT û saziyên navnetewî di mijara Rêbertiyê de ji destpêkê de bi alî û li gorî pêdiviyên polîtîkaya hêzên navnetewî tevdigere. Di esasê de saziyên wan hêzanin ku komplo hunan e. Lewma mirov dikare bîhengiya wan bi alî-

bûna wan pênase bike. CPT ku xwe weke saziyeye maf û azadiyan pênase dika, di pratîkê de ne xwedî wê seknê ye. Di bin bandora siyaseta Ewropayê de tevdigere. Ji destpêkê de pergala tecrîdê ya li Îmraliyê weke rejîmekê pêk tê, neket rojê vî saziyê. Lewma em dikarin bêjin hevkarin. Bi vî çalakîyê em dixwazin lîstika sê meymûnan raxin pêş çavan û bi-hêlin ku li wezîfeyên xwe yên eslî vegere û pêşî li tecrîd û izolasyonê li Îmraliyê bigire.

Rêber Ebdullah Ocalan di pêvajoya Îmraliyê de bi paradîgmaya Netewa demokratîk nexserêya çareserîya pirsgrîrêkên pergala modernîteya kapîtalîst ku ji binî de çareser bike, raber kir. Ev paradîgma bi şoreşa Rojava-Bakurê Sûrî mîsoger bû. Eşkere bû ku pirsgrîrêkên kûr û kor yên civakî û dîrokî dikarin bi vî pergala alternatîf bî çareserîkirin. Pergala li Rojava û Bakurê Sûrî bi demê re saz bû û bû hêviya gel û hêzên dij pergale. Vê yekê di serî de hêzên dagîrkirên Kurdistanê, lê bi taybetî jî hêzên hegemon tirsand. Tîrsa sereke jî vî paradîgmaya Rêbertiyê, an go ji sazûn û jiyani bûna modernîteya demokratîk e. Modernîteya demokratîk bi netewa demokratîk bi beden bû. Hemwext li herêmê dîzayna nû heye ku Kurd xwe di vî demê de bi netewa demokratîk bi pergala dikin. Ev wateya xirabûna hesabên dîrokî yên li ser herêmê ku di navendê de Kurdistan heye. Ji ber vî yekê jin û ve sazûna komploye tî fêmkirin ku bi armanca pêşgirtina pergala bûna paradîgmaya Rêbertiyê ye. Lewma komplo bi awayê êrişê li dijî hemû destkeftiyên tevgera azadiyê di şexxê Rêbertiyê de xwe nû dika.

Tecrîd plana hêzên hegemonone

Di rastiyê de tecrîd tenê bandorê li civaka Kurd nake. Em li çend salên dawî binêrin em ê bibînin ku paradîgmaya Rêber Ocalan bi şoreşa Rojava û Bakurê Sûrî herêmî bû, heta cihanî bû. Ev pergala jî aliye gelên herêmê we hat pejirandin. Ji gelên herêmê û cihanê re bû hêvî. Ev hevî di şoreşa Rojava de pêk hat. Bi tecrîdê re êrişên herî mezin û berfireh li ser destkeftiyên vî şoreşê pêk tên. Helbet şoreş ne tenê bi Rojava re sîno dare, şoreşek herêmî ya bandor li gelên cihanê kirî di rojevê de ye. Lewma mirov dikare bêje, pergala tecrîdê kûrkirin plana hêzên hegemonone e. Ev hêz

Komploya navnetewî zêdeyî 20 sale di rojevê de ye. Helbet qonaxên vê komploye hene. Di qonaxa yekem de armanca komploye tinekirina Rêbertiyê bû. Bi vî awayî armanca komplojgeran ew bû şerek sedsalan bidin destpêkirin. Lê Rêbertiyê bi pêşdînek bêhempa qonaxa pêşî ya komploye pûç kir. Di pêvajoya Îmraliyê de jî komploye xwe bi awayên cuda da der. Geh bi tecrîda di nava tecrîdê de, geh jî bi pêkanînen tund yên li dijî Rêbertiyê, heya destwerdana fîzîkî kete rojevê. Lê belê li hundir berxwedana dîrokî ya Rêbertiyê, li derve jî bi berxwedana gel û tevgerê komplo hat pûçkirin.

naxwazin li herêmê çareserî pêk were. Bi şer û kaosê dikarin li ser piyan bimînin. Paradîgmaya Rêbertiyê ku çareseriyek mayînde raber dika, ji bo van hêzan tê wateya tinebûnê. Eger netewa demokratîk li herêmê berbelav be dê ev hêz nikaribin xwe bi netew-dewleta ku êdî jî hev dika li ser piyan ragirin. Hebûna netewa demokratîk tibenûna van hêzan îfade dika. Lewma mijara tecrîdê bi qasî ku ji bo civaka Kurdistanê giring û jiyani ye, ew qas jî mijarek herêmî û cihanî ye. Ji xwe ev pergala encama komploya navnetewî ya herî êşkere ye.

Rêber Apo tevgera azadiyê weke tevgerê jinê saz kir. Azadiya jinê ruh û vîna vê tevgerê ye. Jin bi tevgera azadiyê re li Kurdistanê û herêmê bû xwedî hebûn, nasname, hêz û pergala. Xwebûna jinê bi feraseta azadiyê ya Rêbertiyê ve yekser girêdayî ye. Paradîgmaya Rêbertiyê jî ji xwe xwe dispêre azadiya jinê. Jin lewma jî hebûna xwe bi hebûna Rêbertiyê bi wate dikin. Peywendîya jinan û Rêbertiyê peywendiyek wateyê, hebûn û xwebûnê ye. Lewma ji destpêkê de li dijî her êrişê li ser Rêbertiyê jin bûn çeperek jî agir. Hîn di sala 1996'an de ku komploye nû xwe dida der, hevala Zilan bi çalakiya canbexşane xwe kir mîtal. Di her qonaxa komploye de jin li qadan bûn. Berxwedana Rêbertî ya li Îmraliyê, li derve bi pêşengiya jinan civakî bû. Jinên ku bi paradîgmaya Rêbertiyê bi wate bûn, ketin ser rêya azadiyê, helbet deynê xwe dibînin ku tecrîdê bişkinin û rêka azadiya Rêbertiyê vekin.

Rêbertî, azadî, wate û xwebûn e

Lewma di pêşengiya Leyla Guvende destpêkirina vî qonaxa berxwedanê zêdetir bi wate ye. Di civaka Kurd de bi paradîgmaya Rêbertiyê jin bû hêza herî dînamîk a şoreşê. Şoreşa jinê a azadiyê bi rêhevalên Rêbertiyê yên weke Sara, bi berxwedana li dijî pergala mîr a xwe bi awayê herî hov DAIS'ê da der cihanî bû. Rêbertî jî bo me jinan azadî, wate û xwebûn e. Ev di wateya hebûnê de bi nasname bûn û jiyana azad bi xwe ye. Rêbertî tevgera jin bi xwe ye. Lewma gotinên, 'JIN', 'JIYAN', 'AZAD' dema ku bi azadiya Rêbertiyê re bi yek bin bi wate dibin. Peywendîya jina azad a bi Rêbertiya azad re ew qas jiyani ye. Di mijarek ewqas giring û jiyani de helbet jin dê xwedî gotin bin û jî wê jî wêdetir dê xwedî çalakî bin. Zilanê li Dêrsimê bi çalakiya xwe a canbexşane banga wateyê da, Sarayê bi hevaltiya Rêbertiyê azadiya jinê li sînorên cihanê da û jina Kurd li Rojava bi berxwedana Rêbertî jiya.

Îro ev pêla berxwedanê ya ji bo şikandina tecrîdê û bi armanca azadiya Rêbertiyê li Kurdistanê û cihanê deng vedide, di serdema finalê de hîn bi wate ye. Ev berxwedana bi reng û dengê jinê berxwedana serkeftinê ye. Yeşîl gotina Rêbertiyê a 'Jina li ber xwe dide azad dibe, jina azad dibe xweşik dibe û jina xweşik dibe tê hezkirin' bi berxwedana Leylayê çiqas li hev tê. Çalakiya me a bi pêşengiya Leylayê pira di navbera banga 'Jin, Jiyan, Azadî û Rêbertiya Azad' e. Azadî eger hebe, vî bi Rêbertiya azad bi wate be.

Leylayê jî warê Sara, Mazlum û Kemalana banga berxwedanê kir. Em jin li her qadê deng didin vî bangê.

Ez bawerim û bi hêvî me ku em ê bi berxwedanê hevdiîna mezin a bi Rêbertiyê re li warên azad pêk bînin. Tenê ji vî re neqebek maye, ew jî vî bi berxwedana jinan rabe.